# <u>Belgeya Zanyariyan derbarê Pergala Bingehîn a Demokratîk a Azad</u>

Îro tu sozdariya xwe derheqê Pergala Bingehîn a Demokratîk a Azad a Komara Federal a Almanyayê de radigihînî .Ev pêşniyaz û pêşmercek ji bo daxwaza derfeta Îqametê (Mayîn) ye (Destûra Mayînê li gorî Beşa 104c, Paragrafa 1, Hevoka 1, Hejmara 1 ji Aufenthaltsgesetz [AufenthG – Qanûna Mayînê, Çalakiya Aborî û Entegrasyona Welatiyên Derveyî di Qanûna Mayînê ya Kewşena Federal]). Mafê derfeta mayînê vê şansê dide te ku şert û mercên pêwîst ji bo mayîna hertimî û qanûnî ya gengaz li Almanyayê dabîn bikî.

Ji bo ku bikarî Mafê Mayînê bi dest bixî, divê tu hin nirx û pîveran bizanî ku gel li gorî wan li Almanyayê bi hev ra dijîn .Ji ber ku çaverêtî ji te jî heye ku pêbendî van nirxan bî .Di heman demê da, tu tenê di rewşekê da dikarî sûdên heyî li jiyana xwe ya rojane bi kar bînî ku van nirxan tê bigihêjî.

Têgeha Pergala Bingehîn a Demokratîk a Azad ku tu îro pêbendî wê yî, giştîtiya van nirxan diwesifîne .Nirx di Qanûna Bingehîn da, hema wisa ku Qanûna Bingehîn a Komara Federal a Almanyayê tê binavkirin, hatine destnîşankirin.

<u>Bi taybet, tu divê babetên xwarê tê bigihêjî û bêyî ti şert û mercekê pêbendî Pergala Bingehîn a Demokratîk a Azad bî û sozdarê wê bimînî:</u>

Almanya demokrasiyeke parlemanî ye .Gel nûnerên xwe bi dengê cîhanî, rasterast, azad, yeksan û nihênî dibijêrin .Ti kesekî xwedan mafê dengdayînê nikare ji dengdayîna xwe were qedexekirin .Her dengek girîng e û giraniya hemî dengan yeksan e .Ti kesek nikare berovajî meyl û daxwaza xwe di dema dengdayînê da bikeve bin bandorê .Mafê kesekî din tineye bizane be ka kê dengê xwe daye kê.

Li Almanyayê gelek partiyên siyasî yên cûrbicûr ên rêpêdayî û bidestûr hene ku dikarin nûnertiya gelek berjewendî û alîgiriyên ciyawaz bikin .Hemî partiyan şanseke yeksan ji bo rikeberiyên hilbijartinê û berbijariya ji bo cihanîna ramanên xwe yên siyasî hene .Aliyên têkildar divê di armancên xwe û kiryarên ku bi rêya wan armancan dişopînin, naveroka Qanûna Bingehîn berçav bigirin .

"Bundestag" wek saziya nûnertîkirina gel (Parleman) di asta herî bilind a hikûmetê da ye .Bi rêya dengwergirtinê pirraniya wê biryar dide ku kî rêbertiya hikûmeta federak wek Serokwezîrê Federal bike .Hikûmeta federal çalakiyên siyasî pêk tîne û ji aliyê Bundestag'ê va tê kontrolkirin . Partiyên derveyî hikûmetê bi hebûna rola Opozîsyon an jî Dijber li Meclîsê, roleke kontrolkirinê ya girîng têkildarî hikûmetê digirin ustiyê xwe .Dibe ku hikûmet ji aliyê Meclîsê û bi rêya dengwergirtinê ji cîgeha xwe were avêtin û di encamê da bi awayekî aştiyane were guhertin.

Almanya dewletek e ku li gorî Qanûna Bingehîn tê birêvabirin .Bundestag hin qanûnan dadirêje ku ji bo tevahiya Almanyayê tên sepandin .Di babetên taybet da, ji bo vê yekê pêwîstî bi razîbûn û pesendkirina eyaletên federal heye .Rêzik û qanûnên darêştî hertim divê sazgar digel Qanûna Bingehîn bin .Bi vî awayî, hemî biryar û hikmên dadgehên Almanyayê jî divê li gorî rêzikên Qanûna Bingehîn bin .Ev yek ji aliyê Dadgeha Qanûna Bingehîn a Federal wek dadgeha herî bilind a Almanyayê va hatiye piştrastkirin .Hemî dadgehên Almanyayê pêwîst e ku qanûnê berçav bigirin .Tevî vê yekê, dadgeh serbixwe ne û nabe ku di biryardana xwe da bikevin bin bandora hikûmet an rayedaran .Hemî kes bêyî berçavgirtina raborî, rewşa darayî û cih û mewkiya ku li nav civakê hene, li dadgehê xwedî mafên yeksan in.

Erkên birêvabirina rojane ji aliyê rayedarên eyaletî û bajarî va bi cih tên .Rayedar jî divê qanûnê berçav bigirin û tenê dikarin li gorî qanûnê tev bigerin .Qanûn ji bo tevahiya gel bi awayekî yeksan tê sepandin .Her kesek ku dikeve bin bandora kiryareke îdarî, dikare wê kiryarê bi rêya dadgehê va vekolîne .

Li Almanyayê mafê ti kesî tineye kontrola xwe bîne ser hikûmetê an kesên ku zorê bi kar tînin . Kiryarên zordariyê tenê bi rêya saziyên hikûmî weke polîs û tenê wek rêkara herî dawî dikarin bi cih bên .Tevî vêya, ev yek tenê li gorî bingeheke qanûnî rêpêdayî ye .Her kiryarek dikare li dadgehê were vekolandin û heta qedexekirin.

Li Almanyayê hikûmet rêzê li maf û azadiyên mirov digire û piştevaniya wan dike .Mafên mirov ên misogerkirî bi rêya Qanûna Bingehîn, nemaze rûmeta mirovî û mafê jiyan û yekparçetiya leşî, ji destdirêjiyê hatine parastin .

Ev yek derbarê pêşketina azad a kesayetiyê de jî derbasdar e, bi vê wateyê ku her kesek biryar û kiryarên xwe tayîn dike .Bi vî halî, mafên kesên din jî nabe ku tûşî kêşeyê bibin û qanûn nabe ku bên binpêkirin .Hemî gel li Almanyayê dikarin nêrînên xwe bi awayekî azad raderbirrînin, lê ev yek ne bi wateya handana bo nefret an tundûtûjiya li kesinan e ku ciyawaz digel wan difikirin . Kombûn û xwenîşandana gelemperî rêpêdayî ye, lê divê bi awayekî aştiyane were lidarxistin.

Qanûna bingehîn her wiha wekhevî û beranberiya hemî mirovan misoger dike .Ti kesek ji ber nijad, dîn an jî baweriyê bi ti awayî nabe ku bikeve ber cihêkarî, azirandin an bêparkirinê . Kiryara ku bi dû armancên dije-cihûyî, nijadperestane, biyanî-fobiya an armancên din ên nemirovî be, ne li gorî vê yekê ye û li dijî vê daxuyaniyê ye.

Hemî zayend yeksan in .Jin, mêr û kesên ku zayenda wan ciyawaz e, xwedî heman mafan in .Ti kesek nabe ku ji ber zayend an jî alîgiriya xwe ya cinsî bikeve ber ziyan û zirarê an tûşî xeterê bibe .Lewma divê mirov digel kesên ku şêwaza wan a jiyanê ciyawaz e jî bi rêzdarî û lihevkirinê tev bigere.

Zanyariyên din ên girîng derbarê pergala mafdariyê de, derbarê çand û dîroka Almanyayê de, dê li kûrsa peydakirina tûş û rêgehê anku oriyentasyonê bo te bên hînkirin .Kûrsa ronkirinê beşeke kûrsa entegrasyonê ye .Piştî dayîna mafê mayînê yê derfetî, te wê mafê xwe yê beşdariya di kûrsa Entegrasyonê da hebe an erkdar bî ku tê da beşdar bibî.

Ji bo wergirtina zanyariyên zêdetir derbarê "Jiyan li Almanyayê"  de ji çavkaniyên pêbawer serdana Portala Hikûmeta Federal bi adresa https://www.make-it-in-germany.com/de/leben-in-deutschland/deutschland-kennenlernen/deutsche-gesellschaft, Rêveberiya Federal a Koçberî û Penaberan di adresa https://www.bamf.de/DE/Themen/Integration/ZugewanderteTeilnehmende/ErsteOrientierung/UnserGrundgesetz/unser-grundgesetz-node.html da an jî Ajansa Federal a Hînkirina Sivîlan di adresa https://www.bpb.de da bike .